Match'In

Pilotprojekt zur Verteilung von Schutzsuchenden mit Hilfe eines algorithmengestützten Matching-Verfahrens

# MATCH'IN ÇI YE

# Û HEKE EZ BEŞDARÎ WÊ BIBIM DÊ ÇI BIBE?

## Ev Projeyê

Weke lêkolînerên ji zanîngehên Hildesheim û Erlangen-Nürnberg ê em dixebitin bi

- Wezareta Karên Civakî û Entegrasyonê ya Hessen ê û Meclîsa Herêmî ya Gießen ê
- Wezareta Karên Malbat, Jin, kultûr û Entegrasyonê ya Rheineland-Pfalz (MFFKI), Serokatiya Daîreya Çavdêrî û Xizmetê ya Rheinlend-Pfalz (ADD) û Wezareta Diakonî
- Wezareta Navxweyî û Werzîşê ya Niedersachsen re
- Wezareta Zarok, Ciwan, Malbat, Wekhevî, Koçberî û Integrasyonê ya Nordrheine-Westfalia re

hev ra dixebitin ji bo alîkarîya we bikin, ku em li Almanyayê cihekî baş ji bo we bibînin.

## Belavkirin - çi dibe gelo?

Hikûmet de we li ser cihekî ji wan

- Li wîlayet Hessen ê
- Li wîlayet Niedersachsen ê
- Li wîlayet Nordrhein-Westfalen ê
- Li wîlayet Rheinland-Pfalz ê

belav bike. Yanî li cihekî ku dibe ku hûn demeke dirêj lê bijîn.

Biryara ku tê dayîn, hûn ê biçin kîjan cihî, tê dayîn ji aliyê kesên ku di hikûmet de dixebitin. Hikûmet her tim hewl didin ji bo tê cihekî herî baş bibînin. Lêbelê, tê nikarin bizanin ka kîjan cih dê ji bo tê baş be, ji ber ku lêkolînek dirêjtir nikare di pêvajoya normal de pêk were.

**Match'In – çi cuda ye, eger tu beşdarî vê projeyê bibî?**

Bi projeya Match'In em dixwazin ku, berî hikûmet biryarê bidin ku hûn ê li ku derê bicih bibin, hûn ê di demeke dirêjt de beşdarî lêpirsîneke bibin.

Lêpirsîn nêzîkî saetekê dewam dike û di odeya şêwirmendiyê de, li vir li gel me tê kirin (Je bo Kontakt ê li rûpela dawî binêrin).

Emê agahiyan tê bidin hikûmet ku biryarê bidin ku tê li ku derê weri. Ji bo vê armancê, me bernameyeke kompîturê pêş xist ku hemû agahîyên tê bi cihên bijartî ra berhev dike. Ji ber vê yekê em dixwazin ku hikûmet cihê herî baş ji bo tê hilbijêrin.

Ji bo em ji we re cihekî guncaw bibînin, me agahî li ser hin cihan

- Li wîlayet Hessen ê
- Li wîlayet Niedersachsen ê
- Li wîlayet Nordrhein-Westfale ê
- Li wîlayet Rheinland-Pfalz ê

kom kirin, wek xizmeta tenduristiyê an jî pêşkêşkirina xanî û kar.

Heke tê dixwazi di projeya me de beşdar bibi, tê pirsnameyekê tijî biki da ku em jî agahdariya pêdivî ya li ser tê hebe. bo nimûne, tê dikari nîşan bidi ka pêdivîya tê bi hin teklîfên tendirûstî an qursa zimanekî heye an jî tê dixwaza çi biki. Eger hûn hûrgilîyên xwe bi taybetmendiyên cihên rûniştinê bidin ber hev, îhtîmala ku cihê ku hûn ê lê werin tayînkirin dê, ji bo taybetmendî û daxwazên we pir baş be. Lê em nikarin vê sozê bidin. **Bi kîjan cihan re Matching pêk tê?**

Li Hessenê ev cih beşdarî projeyê dibin:

- Li Darmstadt ê
- Li Herêma Groß-Gerau ê
- Li Herêma Hersfeld-Rotenburg ê
- Li Herêma Hochtaunuskreis ê
- Li Herêma Main-Taunus-Kreis ê

Li Niedersachsenê ev cih beşdarî projeyê dibin:

- Li Herêma Aurich ê
- Li Herêma Helmstedt ê
- Li Herêma Göttingen ê
- Li Herêma Hannover ê
- Li Hansestadt Lüneburg ê

Li Nordrhein-Westfalenê ev cih beşdarî projeyê dibin:

- Li Bajare Düsseldorf ê
- Li Bajare Krefeld ê
- Li Bajare Preußisch Oldendorf Li Herêma Minden-Lübbecke ê
- Li Bajare Troisdorf Li Rhein-Sieg-Kreis ê
- Li Bajare Wuppertal ê

Li Rheinland-Pfalzê ev cih beşdarî projeyê dibin:

- Li Herêma Birkenfeld ê
- Li Herêma Donnersbergkreis ê
- Li Bajare Kaiserslautern ê
- Li Bajare Koblenz ê
- Li Herêma Mainz-Bingen ê
- Li Bajare Pirmasens ê

Ev te wê wateyê ku eger te beşdarî projeya me bibi, wê cihên di lîsteyê de bên berawirdkirin. Heke ji bo te lihevkirineke baş hebe, te ê biçi cihê ku li gor agahîyên te herî baş ji bo te be. Dibe ku ev cîh ji bo te ne baş bin. Wê demê dibe ku teli cihekî din bên

- Li wîlayet Hessen ê
- Li wîlayet Niedersachsen ê
- Li wîlayet Nordrhein-Westfalen ê
- Li wîlayet Rheinland-Pfalz ê

bicihkirin, ji ber ku hikûmet dibînin ku ev cih ji bo te çêtir e.

**Ma ez dikarim di Match'In (Proje) de beşdar bibim?**

Ji ber ku proje pir nû ye, mixabin niha ne her kes dikare beşdar bibe.

*Hûn dikarin beşdar bibin, eger hûn*

- *18 salî bin û*
- *bi tenê bi vî awayî, di vê navendê de bê hevjîn û bê malbat bi in û*
- *Di prosedura penaberiyê ya bi rêk û pêk de ne.*

⃠ - *Lê mixabin hûn niha nikarin beşdarî Projeya Match'In bibin, eger*

- *ji 18 salî biçûktir in, an jî*
- *bi malbata xwe an hevjîna xwe an hevjînê xwe re li navendê yî, an jî*
- *ji bilî prosedura penaberiyê ya bi rêk û pêk di prosedureke penaberiyê de ne*

Heke tû ne piştrast bi ku tû dikari beşdar bibi, tû dikari bi Navenda Şêwirmendiyê re têkilî biki. Têkilî di rûpela dawîn de ye.

Di pêşerojê de em dixwazin ve projeyê pêşkêşî zêdetir mirovan û malbatan bikin. Heke hûn hê nekarin beşdar bibin, em daxwaza têgihiştina we dikin.

**Ez ne piştrast im ku ez dixwazim beşdar bibim:**

Beşdarbûna di vê projeyê de ji bo te bi dilxwazî ye. Ger te beşdar nebi, wê bandoreke neyînî li ser pêvajoya we ya mafê penaberîyê yan biryarên din ên hikûmetê neke. Beşdarbûn an jî nebeşdarbûn tenê li ser vê pirsê yê ku tu dê paşê biçî ki cî.

Sie können sich auch vorher beraten lassen, ob eine Teilnahme für Sie gut passt. Bitte wenden Sie sich dafür an den Kontakt unten. Tu dikari berî her tiştî ji xwe re şîreta bini, ka beşdarbûn ji bo te baş e an na. Ji kerema xwe re ji bo vê yekê bi têkiliyên jêrîn re têkilî bikin.

Du vebijêrkên te hene:

✓ *Ez beşdarî projeya Match'Inê dibim*

Heke hûn bixwazin beşdarî pêvajoya hevcotkirinê bibin, divê hûn ji bo me çend pirsan bibersivînin. Agahiyên ku hûn didin me, ji bo ku em komîneke ku herî baş ji bo we be, bibînin. Ji ber vê yekê girîng e ku tu bersîvên pirsên bi dilsozî bidî. Daneyên te bêyî razîbûna te nayên belavkirin û di pêvajoya penaberiyê de nayên bikaranîn. Beşdarbûn tu bandorê nade ku hûn çiqas zû bi cih dibin.

⃠ *Ez beşdarê projeya Match'In nabin*

Heke tu naxwazin di pêvajoya hevdîtinê de beşdar bibi, tu dê li gorî rêbaza asayî weri dabeşkirin. Di vî warî de tenê hinek daxwaz û pêdiviyên we têne hesibandin, lê ji bo vê yekê zêdetir şaredarî hene.

Bajarê ku hûn têne şandin dibe her bajarek an jî bajarekî biçûk be li her derê.

- Li wîlayet Hessen ê
- Li wîlayet Niedersachsen ê
- Li wîlayet Nordrhein-Westfalen ê
- Li wîlayet Rheinland-Pfalz ê

li her derê. Tu nikarî cih xwe hilbijêrî.

## Agahiyên din

Heke tu dixwazin ku berî ku tu biryarê bidi, derfetên beșdarbûna projeyê bi kesekî din re nîqaș biki, tu dikari bi șaxê șêwirmendî ya jêrîn re têkilî bikin. Ev navenda șêwirmendiyê dê ji bo hevdîtina Matchingê jî bike, eger hûn hilbijêrin ku beșdar bibin.